Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :452 nameronahi@gmail.com 21- îlon - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

Li Hesekê pirtûka pêşxistina çandiniyê

Navenda Lêkolînên Zanistî ya Hesekê ji bo pêşxistina çandiniyê li herêma Cizîrê gelek xebatan dimeşîne. Her wiha navendê piştî xebatên salekê pirtûkek ku nexşerêyeke çandiniyê li ser asta herêma Cizîrê dihewîne, amade kir. Di pirtûkê de ax di gelek aliyan de tê nirxandin.

Ji bo pêşxistina çandiniyê Navenda Lêkolînên Zanistî ya Hesekê xebatên perwerdekirina kadroyên çandiniyê û taqîkirina ax û hemû pêdiviyên girêdayî çandiniyê dimeşîne.

Axa çandiniyê, cihê xwezayî yê mezinbûna şînahiyan û hilberîna çandiniyê ye. Ji bo wê divê were parastin û neyê qirêjkirin. Ji bo parastina hilberînê divê ax bi awayekî asayî were taqîkirin.

Navenda Lêkolînên Zanistî ya Çandiniyê ya Hesekê dabeşî du beşan dibe. Beşa laboratuarê ji bo taqîkirina av û axê û beşa din ji bo çandina daran û şopandina wê. Şêniyên herêma Cizîrê di asta yekemîn de debara xwe bi çandiniyê pêk tînin. Ji ber wê navendê û ji bo naskirina cureyên ax û kalîteya wê û hilbijartina dar û berhemên guncaw ji bo çandiniyê li herêma Cizîrê geriyan.

Di encama lêkolînan de, navendê nexşerêyeke çandiniyê li ser asta herêma Cizîrê amade kir. Di nexşerêyê de bingeha axê, şor û tirşbûna axê, rêjeya karbonat kalsiyum û madeya fosfor hatin xuyakirin.

Di encamê de navendê pirtûkek bi navê `Broşura nirxandina zeviyên çandiniyê ya herêma Cizîrê` amade kir.

Di broşurê de encamên taqîkirina zeviyan di salekê de hatine diyarkirin.

Têkildarî mijarê Endamê Navenda Lêkolînên Zanistî ya Çandiniyê ya Hesekê endezyarê çandiniyê Îmad Memî diyar kir ku nebicihanîna dewreya çandiniyê hişt ku berdariya axê şûnde here û bandoreke neyînî li ser hilberînê û encama hilberînê ya aborî kir. Ji ber wê divê çareserî ji van pirsgirêkan re bên dîtin. Endanmên Navendê di nav deverên herêma Cizîrê de geriyan û gelek nimûneyên axê û avê taqî kirin û piştre broşur li cotkaran belav kirin.

Memî bang li aliyên têkildar kir ku alîkariya pêwîst bidin wan. Memî diyar kir ku ew zehmetiyan di gelek aliyan de dikişînin û da zanîn ku ew bi hewcedariya alavên çandiniyê û gelek pêdiviyên din in.

Di dawiyê de Memî diyar kir ku ew ê di navendê de beşa tovan aktîf bikin da ku nirxandinek li ser cureya tovên ku çandina wan li herêmê bi ser dikeve, bikin. Her wiha wê nirxandinê li cotkaran belav bikin û wê beşa nirxandina parastina nexweşiyên çandiniyê vekin...***ANHA***

Zivistan hat rewşa li kampên koçberan zehmet e

Bi deh hezaran kes ji ber şerên li herêmên Sûriyê û êrîşên komên çete reviyane û li bakurê Sûriyê bi cih bûne. Niha li bakurê Sûriyê bi deh hezaran koçber kombûne û li kampan hatine bi cih kirin. Lê tevî şertên zehmet û bê derfetiyên li bakurê Sûriyê, saziyên navnetewî yên mirovî û alîkariyê bi rola xwe ranabin û alîkariya pêwîst nadin koçberan.

Bi hatina zivistanê re zehmetiyên koçberên kampa El-Tiwêhnê ya bakurê rojavayê Tebqayê zêde dibin. Jiyana bi hezaran koçberan ji ber kêmasiya alavên germkirinê û xemsariya rêxistinên mirovî di xetereyê de ye.

Li bakurê Sûriyê bi deh hezaran koçberên ku ji herêmên şer reviyane û li kampan hatine bi cih kirin hene. Kampa Tiwêhnê ya li Tepqayê jî yek ji van kampan e. Li kampa El Tiwêhnê ya li Tepqayê bi hezaran koçber yên ku ji ber şer reviyane hene. Rayedar û saziyên bakurê Sûriyê li gor derfetên xwe alîkariya pêwîst didin koçberan. Lê tevî ku erka saziyên alîkariyê mirovî yên navnetewî ye, li hember rewşa koçberan bi erka xwe ranabin û xemsar nêzîk dibin.

Nêzî 6 hezar û 700 mirov di kampa El-Tiwêhnê ya bakurê rojavayê bajarê Tebqayê dijîn. Koçber di kampê de li ser 2 hezar 400 konan belav bûne. Lê ev kon gihiştine astekî ku jiyan lê nabe û ne ji germa havînê û ne jî ji sermaya zivistanê wan diparêzin. Heta niha tu plan an jî projeyek ji bo çareseriya vê pirsgirêkê û kêmkirina zehmetiyên koçberan nehatine pêşkêşkirin.

Têkildarî mijarê Endamê Rêveber ê Kampa El-Tiwêhnê Abdulhadî El-Ebid axivî û da zanîn ku hemû

rêxistinên navdewletî yên ku li herêmê kar dikin û di serî de Komseriya Bilind a Karûbarên Koçberan alîkariyê nadin, cihê kampê veguheze cihekî nû li nêzî gundê El-Mehmûdlî yê bakurê Tebqayê ku hîna nehatiye temamkirin.

El-Ebid wiha domand: "Me hema hema ji hemû rêxistinan û aliyên xêrxwaz re daxwaznameyên alîkariyê pêşkêş kirin, lê hemû bê encam bûn."

Di vê rewşê de kampa El-Tiwêhnê ya ku beriya salekê hatiye avakirin, bi hatina zivistanê re di çarçoveya zêdebûna hejmara koçberan de bi zehmetiyên mezin re rû bi rû ye...***ANHA***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 452 21- îlon- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

Li Efrînê 4 çete hatin kuştin

Çalakiyên şervanên YPG'ê li dijî leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê dewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di çalakiya 19'ê Îlonê yên li navçeya Cindirês û Şiyê yên Efrînê de 4 çeteyên Ehrar El-Şam û Lîwa El-Waqas hatine kuştin, 3 çete jî birîndar bûn.*R-2*

LI DIJÎ DAIŞ Û MÎT'Ê OPERASYON

Hevkariya çeteyên DAIŞ'ê, artêşa Tirk û rêxistina dewleta Tirk a îstîxbaratî li dijî gelên Sûriyê berdewam dike. Hêzên ewlekariya bakurê Sûriyê jî li dijî hewldanên çeteyên dewleta Tirk yên têk birina aramiya gel û herêmê xebatên xwe didomînin û 24 saetan di nava tevgerê de ne.

OPERASYONA HEMWEXT HAT KIRIN

Di vê çarçoveyê de li dijî şaneyeke razayî ya DAIŞ û MÎT'ê operasyoneke serkeftî hat kirin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku 19'ê Îlonê Hêzên Antî Teror ên Asayîş, YPG û YPJ'ê li dijî hucreyên çeteyên DAÎŞ'ê û artêşa Tirk ên li gundê Qûbbê û Ceddê yên navçeya Şêxler a Kobanê operasyoneke hemwext kirine. Di operasyonê de bi dehan çete hatin girtin û rêjeyek çek hate desteserkirin.

XWE BI NEPENÎ BIRÊXISTIN DIKIN

YPG'ê derbarê operasyonê de agahî da û wiha got, "Çeteyên dewleta Tirk a dagirker û DAÎŞ yên ku hewl didin rewşa aram û ewle ya li Bakûrê Sûriyê qels bikin, bi armanca pêkanîna xebatên terorê xwe di herêmê de bi awayekî nepenî rêxistin dikin. Li Kobanê, ev komên ku pêwendiya xwe bi MÎT û DAÎŞ'ê re hene û ev demeke ku di bin çavdêriya hêzên ewlehiyê de bûn, bi operasyonek taybet ya hevbeş ya hêzên Asayîş û hêzên me ve hatin bêbandorkirin.*R-5*

Îdlib êdî beşeke Tirkiyê ye

Siyasetmedar Aldar Xelîl derbarê rewşa Îdlibê de axivî û diyar kir ku bi peymana di navbera Tirkiye û Rûsyayê re êdî Îdlib buye beşeke ji Tirkiyê û wiha got, "Ev pêngav temamkirina projeya Erdogan a Sûriyê ye ku li Cerbalûs û Babê dest pê kir û niha li Efrîn û Idlibê didomîne." *R-4*

Hevdîtinên bi rêjîmê re negihiştiye encamê

Hevseroka MSD'ê Emîna Umer di konferansa Yekîtiya Mamosteyan a Tepqayê de axivî û rewşa Sûriyê û hevdîtinên bi rêjîmê re nirxand. Emîna Umer got, "Hevdîtinên me bi rêjîmê re didomin lê heta niha negihiştiye encamê." Emîna diyar kir ku hevdîtinên navnetewî yên ku nunerên Bakurê Sûriyê neyên beşdarkirin encamên wê, wan eleqedar nakin. *R-4*

Bi hezaran Qamişlo'yî ji bo Efrînê meşiyan

Meş û çalakiyên welatiyên bakurê Sûriyê yên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bi armanca xwedî derketina berxwedana gelê Efrînê berdewam dikin. Bi vê armancê bi hezaran welatiyên Qamişlo di bin durûşmeya "Bi rihê Berxwedana Serdemê em ê Efrînê rizgar bikin" meşiyan. Di meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û hat gotin ku ew ê li hember dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê têkoşîna xwe berdewam bikin heta ku Efrînê rizgar bikin. *R-2*

Hejmara koçberên kampa Îwa zêde dibe

Pêşdeçûna Şervanên QSD'ê ya li Dêrazorê li dijî DAIŞ'ê dewam dike. Şervanên QSD'ê wê di qonaxa dawî de bajaroka Hecîn ji çeteyan rizgar bikin. Hêjmara welatiyên ku ji herêmên di bin serweriya DAIŞ'ê de ne direvin berê xwe didin kampa Îwa. Ev hêjmar roj bi roj zêde dibe. *R-6*

6 leşker hatin kuştin, 2 sîxûr jî hatin cezakirin

Gerîlayên HPG'ê li başûr û bakurê Kurdistanê rêze çalakî kirin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê derbarê çalakiyên gêrîla de daxuyanî da û diyar kir ku hêzên wan li herêma Lêlîkan a Başûrê Kurdistanê 2 leşker, li Çelê jî 4 leşker hatin kuştin. Li navçeya Qilaban a Şirnexê jî 2 kesên 'Sîxûrê MÎT'ê' hatin cezakirin. *R-2*

Parlementerê HDP'ê yê berê jiyana xwe ji dest da

Îbrahîm Ayhan ê di partiya HDP'ê de ji bo du deman parlemeteriya Rihayê kir, ji ber kirîza dil jiyana xwe ji dest da. Îbrahim Ayhan, li bajarê Hewlerê yê başûrê Kurdistanê krîza dil derbas kir. Hevjîna Îbrahîm Ahyan Rezan Ayhan, diyar kir ku wê biçin Hewlerê cenaze wergirin. Ayhan, ani ziman ku wê cenaze li Rihayê defin bikin. *R-2*

Hîzbullah: Em ê li Sûriye bimînin

Serokê Hîzbullahê Hesen Nasrallah destnişan kir peymana ku li ser Îdlibê ku hatiye kirin têkildarî hebûna Hîzbullahê ya li Sûriyê ti guhertinekê çê nake. Nasrallah got, "dema ku şerê hêzan ên li ser sînor kêm bûn wê di kêmbûna hêzên Hîzbûllahan de jî kêmbûn bibe." *R-2*

Bi hezaran Qamişlo'yî ji bo Efrînê meşiyan

Meş û çalakiyên welatiyên bakurê Sûriyê yên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bi armanca xwedî derketina berxwedana gelê Efrînê berdewam dikin. Bi vê armancê bi hezaran welatiyên Qamişlo di bin durûşmeya "Bi rihê Berxwedana Serdemê em ê Efrînê rizgar bikin" meşiyan.

gundewarên wê ji bo rizgarkirina Efrînê daketin qadan û bi yekdengî gotin "Bi rihê Berxwedana Serdemê em ê Efrînê rizgar bikin." Şêniyên bajarê Qamişlo û gundewarên wê bi dirûşmeya "Bi rihê Berxwedana Serdemê em ê Efrîn rizgar bikin" meşeke li dar xistin. Meş ji çerxerêya Sawamî ya taxa Enteriyê ya bajarê Qamişlo destpê kir. Bi hezaran welatî tev li meşê bûn.

Di meşê de wêneyên Reberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wêneyên şehîdên Berxwedana Serdemê, hatin rakirin. Di meşê pankartên bi nivîsa "Yan Efrîn yan Efrîn, bi rihê Berxwedana Serdemê em ê Efrîn rizgar bikin, Na ji guhartina demografyaya Efrînê re" hatin hildan.

Meş li pêşiya Goristana Şehîd Delîl Sarûxan veguherî mitingê.

Li vê derê Hevserokê Meclisa Rêveber a Kantona Cizîrê Abdûlkerîm Sarûxan axivî û wiha got "Li dijî kiryarên qirejî yên dewleta Tirk a dagirker dewletên navnetewî bedengiya xwe diparezin. Em bêdengiya wan şermezar dikin. Hemû êrîşên hovanê li Efrînê berçavên hemû cîhanê hat kirin. Lê ji bo berjewendiyên xwe dengê xwe nekirin. Ji bo berjewendiyên xwe di Idlibê de hemû cîhan bû xwedî helwest. Ew dagirkeriya ku li Efrînê ber çavên hemû cîhanê hat kirin çima helwest nehat diyar kirin? Siyasetên ku tê kirin ji bo qirkirina gelê Kurd e. Efrîn mifteya çareseriya pisgireka Rojava û Bakûrê Sûriyê ye. Heya Efrîn rizgar nebe tu çareseriyê nikarin pêk bînin. Çalakiyên me êdî wê ji bo azadiya Reberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û rizgarkirna Efrînê be. Em Efrînê bernadin û heya dawî jî ber xwe bidin."

Welatiyên ku beşdarî meşê bûn diyar kirin ku ewê heta dawî ji bo rizgar kirina Efrînê têkoşîna xwe bidomînin.

Jina bi navê Selma Mihemed got: "Em kiryarên Erdogan û çeteyên wî li dijî gelê Efrînê bi tundî şermezar dikin. Emê heta dawî li dijî dagirkeriya li Efrînê li ber xwe bidin."

Endama SYPG'ê Bêrîtan Asya jî wiha got: "Gel bi vê meşê nameyekê ji dîktetor Erdoxan û ji dewletên Navnetewî re dişîne û dibêje "Emê heya dawiyê bi berwxedana Efrînê re bin. Têkoşîna me wê li himberî dagirkeriyê berdewam bike."

Jina bi navê Nura Osman jî wiha got: "Erdoxan li dijî sivîlên Efrînê kiryarên hovane pêk tîne. Emê ti carî li hember zilmê bêdeng nemînin û tekoşîna xwe xurt bikin."

Welatiyê bi navê Ebdilkerîm Şiyar jî got: "Efrîn wargeha berwxedanê ye, em ê bi têkoşîn û berxwedana xwe Efrînê ji dagirkeran rizgar bikin."

Mîtîng bi durûşmeyên soza rizgarkirina Efrînê bi dawî bû.

6 leşker hatin kuştin, 2 sîxûr jî hatin cezakirin

Gerîlayên HPG'ê li başûr û bakurê Kurdistanê rêze çalakî kirin. Di van çalakiyan de 6 leşker hatinkuştin, 2 kesên li gel MÎT'ê jî kar dikirin hatin cezakirin.

Li gorî daxuyaniya ji aliyê Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ve hate kirin li devera Lêlîkan a Başûrê Kurdistanê 2 leşker, li Çelê jî 4 leşker hatin kuştin, 7 jî birîndar bûn. Li navçeya Qilaban a Şirnexê jî 2 kesên 'Sîxûrê MÎT'ê' hatin cezakirin.

HPG'ê diyar kir di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên wan 19'ê Îlonê li Başûrê Kurdistanê, li Sidêkanê, li girê Lêlikan a herêma Bradostê çalakiyek dijî artêşa TC'ê ya dagirker kirin. Di çalakiyê de ku ji du baskan ve kozik û stargehên wan bûne hedef, 2 leşker hatin kuştin.

19'ê Îlonê saet 09.40'î hêzên me li Deştanê ya navçeya Çelê ya Colemêrgê, li dijî artêşa TC'ê ya dagirker çalakiyek kirin. Di çalakiyê de bi serkeftî derb li kozikê dijmin ket, 4 leşker hatin kuştin û 7 jê birîndar bûn.

DU 'SÎXÛR' HATIN CEZAKIRIN

Kesayetên bi navê Ubeyid Adiyaman û Selman Adiyeman ên ev demeke li gel MÎT'ê kar idkin 17'ê Îlonê saet 11:00'an hêzên me li Kêla Memê ya girêdayî navçeya Qilaban a Şirnexê ceza kirine. Tevî ku ev her du kesayet ji aliyê hêzên me ve bi dehê caran hatibûn hişyarkirin jî, hevkarî li gel MÎT'ê hêzên û destê wan di şehîdkirina hevalên me de hene. Ti sûc û kiryarên li dijî gelê me û gerîla bê kirin wê bê bersiv nemîne."

Artêşa Tirk agir berda Çiyayê Zelê

Ji ber bombebarana artêşa Tirk a li Çiyayê Zelê ya li Nazimiya Dersimê agir bi çiyê ket. Şewata ku nayê vemirandin, berfireh dibe.

Ji ber bombebarana artêşa Tirk agir bi Çiyayê Zelê ya Nazimiyeya Dersimê ket. Li gorî agahiyan ji ber bombebaranê agir bi çiyê ketiye û şewat berfirehtir dibe.

Li Dersimê îsal ji ber operasyonên artêşa Tirk agir bi gelek daristan û çiyayan ket. Herî dawîn agir bi herêma Kûtûdereyê ketibû. Kesên ku ji bo tefandina şewatê xwestin biçin herêmê jî, ji aliyê leşkeran ve hatibûn astengkirin. Piştî barîna baranê agir bi xwe vemirîbû.

5 milyon zarok bi birçîbûnê re rû bi rû ne

Rêxistina Sivîl a Ingilîz Save the Chîldren ku mafê zarokan diparêze diyar kir li Yemenê 5 milyon zarok li ber xetereya birçîbûnê ne.

Save the Chîldren di raporê de diyar kir li Yemenê birçîbûneke wiha heye ku beriya niha mînakên wê nehatine dîtin. Li gorî NY'yê krîza herî mezin a cîhanê li vî welatî ye.

Midûrê Save the Chîldren Helle Thornîn-Schmîdt, "Li bakurê Yemenê li nexweşxaneyeke perwerdehiyê, dema ku min serdana wan kirî, zarok bi qasî ku nikaribin bigirîn li xwe şikandibûn, ji birçîbûnê hal di laşê wan de nemabûn''.

Li gorî Fona Zarokan UNÎCEF'ê di şerê Yemenê de 2 hezar û 200 zarok hatine kuştin.

Duşemê ji bo bajarê stratejîk ê welêt Hudeydeyê bistîne hêzên hikûmetê yên bi desteka koalîasona Ereb a bi pêşengiya Siûdî dîsa operasyon da destpêkirin. Operasyon dibe asteng ku alîkariya mirovî derbas bibe.

Parlementerê HDP'ê yê berê jiyana xwe ji dest da

Îbrahîm Ayhan ê di partiya HDP'ê de ji bo du deman parlemeteriya Rihayê kir, ji ber kirîza dil jiyana xwe ji dest da.

Îbrahîm Ayhan ê di nava HDP'ê de ji bo du deman parlemeriya HDP'ê ya Rihayê kir, jiyana xwe ji dest da.

Parlamenterê HDP'ê yê berê yê Rihayê Îbrahim Ayhan, li Bajarê Hewlerê yê Herêma Kurdistan a Federe krîza dil derbas kir.

Hevjîna Îbrahîm Ahyan Rezan Ayhan, agahî piştrast kir û diyar kir ku wê biçin Hewlerê cenaze wergirin. Ayhan, ani ziman ku wê cenaze li Rihayê defin bikin.

Parlamenterê HDP'ê yê Rihayê Îbrahîm Ayhan di serdema 24 û 25'an de wekîltiya Rihayê kiribû. Îbrahim Ayhan, di 5'ê Cotmeha 2010'an de ji doza KCK'ê hatibû girtin û di 3'ê Çileya 2014'an de hatibû berdan.

Hîzbullah: Em ê li Sûriye bimînin

Nasrallah bal kişand ser peymana tê pêşdîtin a rawestandina operasyona li dijî Îdlibê de, ragihand ku Hîzbûllah 'heta fermanekî nû' wê li Sûriyê bimîne.

Serokê Hîzbullahê Hesen Nasrallah destnîşan kir peymana ku li ser Îdlibê li hevkirî de têkildarî heyîna Hîzbûllah a li Sûriyê ti guhertinekê nade çêkirin û got: "Piştî peymana Îdlibê û şûnde heta aramîbûna piştî Îdlibê jî em ê bimînin."

Nasrllah da xuyakirin ku heyîna leşkerî ya li Sûriyê pêwîstiyeke ya rejîma Sûriyê ye û bi erêkirina wan bûye. Nasralah destnîşan kir dema ku şerê hêzan ên li ser sînor kêm bûn wê di kêmbûna hêzên Hîzbûllahan de jî kêmbûn bibe.

Liderê Hîzbûllahê, diyar kir ku eger di çarçoveya plana lihevkirinê ya li Îdlibê pêk were de, wê li Sûriyê 'aramî' pêk were û wê demê wê ti 'xetên eniyan' nemînin.

Li ser daxwaza Rejîma Sûriyê sala 2013'an bi hezaran çekdarên Hîzbûlahê çûn welat, bi taybet li herêmên nêzî sînorên Libnanê şer kirin.

Li Efrînê 4 çete hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di çalakiyê 19'ê Îlonê yên li navçeya Cindirês û Şiyê yên Efrînê de 4 çeteyên Ehrar El-Şam û Lîwa El-Waqas hatine kuştin, 3 çete jî birîndar bûn.

YPG'ê destnîşan kir ku li navçeya Cindirês û Şiyê yên Efrînê li dijî çeteyên çeteyên Ehrar El-Şam û Lîwa El-Waqas çalakî hatine kirin û di çalakiya li gundê Xezawiye Cindirêsê ya li dijî çeteyên Ehrar El-Şam de çeteyên bi navê Îbrahîm el-Rabîa û Atta el- Mûsa ên ji Hemayê hatin kuştin.

Di dewama daxuyaniyê de ev agahî hatin dayîn: "Di roja 19'ê Îlonê de hêzên me li gundê Xezawiyê yê girêdayî navçeya Cindirêsê ya Efrînê çeteyên girêdayî koma Ehrar el-Şam kirin hedef û bi bandor lêdan. Di encama çalakiyê de 2 çete hatin kuştin, 3 çete brîndar bûn.

Navên çeteyên ku hatine kuştin wiha ne: Îbrahîm el-Rabîa (Hama), Atta el-Musa (Hama).

Di heman rojê de yekîneyên me li gundê Hekîçê ya navçeya Şiyê ya ser bi Efrînê ve li hember 2 çeteyên girêdayî koma bi navê Lîwa el-Waqas çalakiya kêmîn pêk anîn. Di encama çalakiyê de her du çete hatin kuştin û çekeke MG3 hate desteserkirin."

Pêşxistina hişmendiyê erka mamosteyan e

Yekemîn Konferansa Yekitiya Mamosteyan a herêma Tebqayê bi dirûşma "Dest bi dest ber bi avakirina nifşên pêşerojê ve" li Akademiya Şehîd Xalid Ilêwî hat lidarxistin. Di konferansê de li ser rola mamosteyan ya pêşxistina civakê de hat destnîşan kirin. Di konferansê de, Desteya Rêveber a Yekitiya Mamosteyan ku ji 7 endaman pêk tê hate hilbijartin.

Yekemîn Konferansa Yekitiya Mamosteyên herêma Tebqayê bi erêkirina rêzikanameya yekitiyê û hilbijartina rêveberiya nû bi dawî bû.

Yekemîn Konferansa Yekitiya Mamosteyan a herêma Tebqayê bi dirûşma "Dest bi dest ber bi avakirina nifşên pêşerojê ve" li Akademiya Şehîd Xalid Ilêwî ya Tebqayê hat lidarxistin. Şande ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, kesayetên navdar û bi dehan mamosteyên herêmê di konferansê de amade bûn.

Hevserokê Meclisa Zagonsaz a herêma Tebqayê Hamid El-Ferec axivî û bi xêrhatina mamoste û şanadeyên bakur û rojhilatê Sûriyê kir û cangoriyên azadiyê bi bîr anîn.

El-Ferec ji bo mamosteyan wiha got: "Rakirina hişmendiya tarî ya ku DAIŞ'ê di mejiyê zarokan de çandibû erka mamosteyan e." Hamid El-Ferec girîngiya avakirina nifşeke azad û belavkirina çanda biratiya gelan anî ziman.

Piştî axaftinan, rêziknameya Yekitiya Mamosteyan hate xwendin û li ser bendên wê nîqaş hatin vekirin û bi erêkirina hemû mamosteyan rêzikname hate pejirandin.

Di dawiya konferansê de, desteya rêveber a Yekitiya Mamosteyan ku ji 7 endaman pêk tê hate hilbijartin.

Xwedî li çand û dîrokê derdikeve

Dayika Salîha ku bi salan e destar bikartîne diyar kir ku destar bi ked û parastina jinan hatiye van rojan. Salîha destnîşan kir ku ew bi bikaranîna destarê çand û dîroka xwe diparêze û bang li jinan kir ku xwedî li çanda xwe derkevin.

Rengê jiyana civakê li her deverê cuda ye. Her dever jî li gor çanda xwe jiyana xwe berdewam dike. Şert û mercên jiyanê bandor li ser mirovan dikin. Lê dîsa jî mirov di hemû şert û mercan de li gor çanda xwe dijîn. Li Kurdistanê ji dîrokê heta niha jin parastina alavên dîrokî yên weke destar dikin ku destar çanda herî kevnar a ku jinan heta roja îro parastiye ye. Her çiqas alavên pêşketî jî derketibin lê jin her dem bi armanca ku vê çanda xwe biparêzin, nîsk, genim û hwd. ku pêdiviya wan pê hebe, bi destar hêranê dikin.

XWEDÎ LI DÎROKA XWE DERDIKEVE

Yek ji van jinan ku çanda xwe diparêze dayika Salîha Kanay 85 salî ye ku heta niha destar bikar tîne. Dayika Salîha Kanay di sala 1975'an di dema erdhêja Lice de ji Licê koçî Amedê dike, li gel hemû şert û mercên jiyanê jî xwedî li dîroka xwe derdikeve û dixwaze vê dîrokê bide jiyan kirin.

DESTAR BI KEDA JINAN HATIYE VAN ROJAN

Kanaya, di sedema bikaranîna destarê wiha vedibêje: "Jin xwedî li çanda jinên afrîner ên dîroka kevnar derdikevin û ev çand heta roja îro anîne. Jinên Kurd heta dawiyê li çanda xwe xwedî derketine û destar jî çandeke wan e. Destar amûreke xwezayî ye û tişa ku pê tê hêrandin xwezayîbûnê winda nake û ji ber vê taybetmendiya xwe em destarê bi kar tîne. Destar heta roja îro bi ked û parastina jinan hatiye van rojan û naxwaze ev çand ji holê bê rakirin. Bi armanca parastina vê çanda ku li ber windabûnê ye, ez di her demsalê de bi kar tînim. Çiqas çand were parastin ewqasî jî dîrok tê mayîndekirin."

PARASTINA ÇANDÊ PARASTINA NASNAMEYÊ YE

Kanay da zanîn ku ew ji ciwantiya xwe heta îro bi destarê hêrandinê dike û wiha axivî: "Ji zaroktiya xwe de ez destarê bikartînim. Wê demê hemû jinan bi destan pêdiviyên xwe yên hêranê bi cih dianîn. Lê niha ev çand gelek kêm bûye. Sedema wê jî pêşketina teknîkê ye. Pêşketina teknîkê girîng e lê nayê wateya ku mirov dûrî çanda xwe ya resen bikeve, ji ber ku parastina çandê, parastina nasnameya mirov e. Bi destarê em nîsk, genim, ce, savar, garis û hwk. pêdiviyên xwe dihêrim.

Ev karekî zehmete lê belê bi tendurist e. Ji bo ku ev dîrok neyê windakirin ev 70 sal e ez vê dîrokê didim jiyankirin. Ji vî karî re sebir û xebat pêwîste. Jinên Kurd bi afrênerî û keda xwe ev dîrok heta roja me ya îro aniye. Weke pêşiyên me gotiye, 'mişkên aşê birçî namîn' Ev gotin ji bo kesên dikarin kare xwe bikin hatiye gotin."

LI GORÎ AHENGA DENG HÊRANÊ DIKIN

Dayika Kanay destnîşan kir ku di çanda jinên afrîner de jiyaneke komînal hey û ev tişt got: "Dema ku jin ji bo karê hêranê li dora destar û her wiha amûrên dîrokî kom didin çanda stranbêjiyê jî li wê derdikeve holê. Jinên ku li dora destar kom dibin li gorî ahenga dengê destarê ku derdixe, stranan dibêjin û çanda stranbêjiyê jî pêsve dibin."

XWEDÎ LI ÇANDA XWE DERKEVIN

Herî dawî dayika Salîha Kanay, bang li hemû jinan kir ku xwedî li çanda xwe derkevin û wiha bi dawî kir: "Divê jin xwedî li çanda xwe derkevin û bi taybetî jî li çanda jinên afrîner ku heta roja îro ji berhemên wan sûdê digirin. Divê bi taybet jinên ciwan xwedî li vê dîrokê derkeve û hewl bidin vê çandê zindî bihêlin."…*ANF*

Peykera Îştarê neqişand

Ciwanê bi navê Mihemed ji ber hezkirina xwe ya şêwekariyê, piştî gelek hewldanan li ser liba patatê karî rûyê mirovekî xêz bike. Piştî ku fêrî hunera şêwekariyê bû, peykereke xwedawenda Îştar neqişand.

Ciwanê bi navê Mihemed Elî ji gundê Mîrkan ê girêdayî navçeya Mabata ye. 17 salî ye û malbata wî ji bav, dê û 2 xwişkan pêk tê. Mîna gelek şêniyên Efrînê ji ber dagirkeriyê neçar ma ji Efrînê derkeve û li Şehbayê bi cih bû, niha jî li Kampa Berxwedan dimînin. Mihemed Elî têkildarî hunera xwe axivî û destnîşan kir ku ji beriya 3 mehan ve dest bi hewldanên şêwekariyê kirie. Di tecrubeya yekemîn de rûyê mirovekî li ser libeke kartolê neqiş kir û piştî gelek hewldanan di dawiyê de fêrî vê hunerê bû. Bi demê re armanca Mihemed mezin bû. Mihemed diyar kir ku hunera şêwakariyê ji wênesazekî bi navê Ebo Corc fêr bûye. Mihemed nêzî mehekê hunera şêwekariyê fêr bûye. Destpêkê bi çimento rûyê kesayetan neqiş kir. Ji berhemên wî yên yekemîn serê Feron e.

Piştre Mihemed di dirêjahiya mehekê de bedena xwedawend Îştar neqiş kir. Lê karê Mihemed ji ber tunebûna çîmentoyê negihişt serî.

Ji ber nebûna pêdivî û alavên şêwekariyê, Mihemed neçar dimîne ku kêr bi kar bîne.

Tevî xebatên wî, Mihemed li Desteya Çand û Hunerê di beşa şanoyê de dewam dike…*ANHA*

Belgefîlma êrîşên li ser Kobanê xelata herî baş girt

Belgefîlma Bîr a ku derhêneriya wê Veysî Altay kiriye, di Mihrîcana Fîlmên Navneteweyî ya La Paz de û Belefîlma Nûjîn a heman derhênerî di Mihrîcana Fîlmên Navneteweyî ya Atlantik de xelatên belgefîlmê herî baş wergirt.

Derhêner Veysi Altay bi belgefîlmên Bîr û Nûjîn xelatên belgefilma herî baş wergirt. Altay, bi Belgefîlma Bîr di Mihrîcana Fîlmên Navneteweyî ya La Paz de û bi Belefîlma Nûjîn di Mîhricana Fîlmên Navneteweyî ya Atlantik de xelatên belgefîlmê herî baş wergirt. Belegîlma Bîr di 5-8'ê Îlonê de li Bolivya di Mihrîcana La Paz de hat pêşandan û fîlma herî baş hat hilbijartin. Belgefîlma Nûjîn ku êrîşên DAIŞ'ê yên li dijî Kobanê digire dest jî di 12-15'ê Îlonê de li Kolombiya li Mihrîcana Navneteweyi ya Atlantik hat pêşandan û wekî belgefîlma heri baş hat hilbijartin. Nûjîn berê jî li Mihrîcana Fîlman a Babel li Îtalya hatibû hilbijartin. Belgefîlma Bîr jî li Hindistanê di mihrîcana Fîlman a Lakecityê de wekî çîroka baş hatibû hilbijartin.

Xwe ji bîr kirin

Rotînda YETKÎNER

Despêkê her hevalek wek min belkî ji min bêtir bi hstên şoreşgerî, ji bo gelê Kurd an ji bo mirovahî an jî bo hemu van erkên mirov bîne cih tevlî Tevgera Azadiyên bûn ez bê şuphe bi veya bawerim. Kêm kesayet dibe ku wekê din derfetê jiyanê li pêşya xwe nedî û xwe avêt bextê hêza Azadiyê. Lê dem borî û sal derbasbûn, gelek kesên ku li bêendê bûn wê Şoreş din ava deha an pazde salanda serkeve û wê ji erkên civakî xwe rizgarke û hinek bi kesayeta xwe re bijî. Nebû! Bêlê mixabin dagirkerên Kurdistan hê jî dîn û harin û hê jî daxwaziya tunebûna Kurdan dikin.

Bêl ew dijminin û em dikarin bejin erka wan jî ev, lê me çima armac, daxwaz û erka xwe ji bîrkir? Dema me dest bi hunandina hunerê kir an jî partî got: "tu dikarî ve karê bikî" û em ketin nava xebatê, bendewariya me çibû? Ji bo ku em rojek tenê nav û dengê me hebe û bi tenê em û em bin?

Ewqas stranê ser şehîdanç ser qehremaniyên gerîlla û mizdana nerxên şoreşê ji bo çibû?

Her mirov bi qasê demek kurt an jî dijê dijê û dure bixwaze û nexwazê wê dawî li temenê wê-wî bê. Girîng ewe ku di vê dema kurt an dirêj de, mirov çi dadirxe ji bo paşerojan.

Gotinekê kal û pîrên me heye gelek bi menekê kure, tê gotin. "tu çûyî derek an welatekê, ger mirovê wêderê korbin divê tu jî çavek xwe derbixî" ez jî vê hevokê usa têdighêjim, mirov alîgir an mîlitan an ji dildarê hezekê şoreşker be û bi dehan sala din av wê rexistinêde bijî, dive gelek tiştan ji xwere bistîne. Lê hinek kes hene û nav jî hunermed, siyasetmedararin, tu lê dinêrî deh, bîst an sî sal wekê ker û lal û koran maye din ava me de.

Ere ev kesana usane û ger ez dibînim hevalê li jor bêtir û pirtirê min dibnin. Dibînin lê hîç dest nadin heta wan kesan bi salan li ser destan û tim di revebiriyanda dêhêlin. Gelo ev ne nakokiyek kure?

Kesekê bîst, sî sal di qada ku têde kar dike em bên huner, ger li du xwe xebatek ber çavan, berhemen ji bo paşerojan an şagirtek nahêle tu çava bi salan ji ve kese memnunî? Wê deme ev kesên popîlîst hîç suçtar nini, pirsgirek tarzen tê meşandine. Mabesta min divir da, em li jor sekinîne û tim rexne li bin dikin, lê ney ji bîrkirin ku ên ku jêr dide meşandin jore.

Gelek Ciwan henê û ez nezda dinasim, di konservatuarê Ewrupa da dixwînin, doktora dikin, ev kesana ditirsin ku bên gel me. Ji ber ku kesên zana û têgihişti nikarin derfetên jiyanê bi dest xin li gel ev kesên bîst û sî salane xwe bi cîh kirine de. Mînak ev deh sal tê gotin koroyek netewî bête darxistin, gelo li ber veya kelem çiyê? Çima naye avakirin? Kî an kê nahêle? Divê em deriyê xwe ji tu kesên ku bixwaze ji bo gel, huner an şoreşê kar bikere negrin, lê divê em nehêlin tu kes jî bibe kelem ji ên dixwazin bên gel me re.

Hejmara koçberên kampa Îwa zêde dibe

Pêşdeçûna Şervanên QSD'ê ya li Dêrazorê li dijî DAIŞ'ê dewam dike. Şervanên QSD'ê wê di qonaxa dawî de bajaroka Hecîn ji çeteyan rizgar bikin. Hêjmara welatiyên ku ji herêmên di bin serweriya DAIŞ'ê de ne direvin berê xwe didin kampa Îwa. Ev hêjmar roj bi roj zêde dibe.

Hejmara koçberên ku ji herêmên di bin serweriya çeteyên DAIŞ`ê de direvin, zêde dibe. Meclisa Sivîl a Dêrazorê jî li gorî derfetên xwe alikariya wan dike.
Hejmara sivîlên ku ji herêmên di bin serweriya çeteyên DAIŞ`ê de direvin, ber bi herêmên ku ji aliyê şervanên QSD`ê ve hatine rizgarkirin ve, zêde dibe. Piraniya koçberan zarok, pîr û jin in.
Şêniyên wan herêman berê xwe didin kampa Îwa ya bakurê bajarokê Hecîn. Tevî tevgera koçberan di kampê de zêde ye jî, lê rewşa koçberan ji aliyê rêxistinên navdewletî û herêmî ve hatiye paşguhkirin.
Yek ji rêveberên kampa Îwa Mihemed El-Casim diyar kir ku di qonaxa dawîn a Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê "Şerê Tunekirina Terorê" de li dijî çeteyên DAIŞ`ê bi sedan sivîl ji bajarokê Hecîn derketin û berê xwe dan bakurê bajarok. El-Casim da zanîn ku Meclisa Sivîl a Dêrazorê li gorî derfetên xwe alîkariya welatiyan dike.
Bi pêşdeçûna şervanên QSD`ê ber bi aliyê rojhilatê bajarokê Hecîn ve da ku baregehên dawîn ên çeteyên DAIŞ`ê rizgar bikin, tevgera koçberan zêde dibe…*ANHA*

Ji 2 hezar û 500 kesî re kar hat dîtin

Buroya Xebitandinê ya girêdayî Komîteya Karûbarên Civakî a Meclisa Sivîl a Reqayê derfetên kar ji zêdetirî 2 hezar û 500 kesan re peyde kirin.
Meclisa Sivîl a Reqayê di 18`ê Nîsana 2017`an de hate damezirandin. Ji nava Meclîsê Buroya Xebitandinê ya girêdayî Komîteya Karûbarên Civakî û Kar hat ava kirin. Buro hewl dide derfetên kar ji welatiyan re peyde bike.
Ji bo peydekirina derfetên kar gelek welatî serlêdana buroyê dikin û navên xwe tomar dikin.
Buroyê ji bo peydekirina kar ji hemû beşên civakê re di saziyên sivîl ên girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê û rêxistinên mirovî de dixebite.
Hejmara kesên ku navê xwe li buroyê tomar kirine 20 hezar e. Heta niha zêdetirî 2 hezar û 500 kes di nav sazî û meclisan de hatine bi cih kirin.
Têkildarî mijarê Endamê Rêveber ê Buroya Xebitandinê ya girêdayî Komîteya Karûbarên Civakî Ibrahîm El-Neîmî wiha got: "Ji bo derfetên kar rojane welatî serlêdana buroyê dikin û navên xwe tomar dikin. Kesên ku tomar bûne wê bi rêya pêşbirkan û li gorî asta xwendinê û pîşeyên wan werin pejirandin."
El-Neîmî wiha got: "Di rojên pêş de wê derfetên kar hîn bêtir ji welatiyan re were dîtin. Di vê mehê de pêşbirka nobetdariya dibistanan heye û wê 600 karkerên mêr û 300 karkerên jin bên qebûlkirin û wê li Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Meclisa Sivîl a Reqayê werin erkdarkirin."…*ANHA*

Li kampa Eyn Îsa wê dibistan bên vekirin

Ji bo zarokên li kampa Eyn Îsa rêveberiya kampê bi hevkariya rêxistinên mirovî ku li kampê kar dikin, dibistanan vedike. Her wiha bang li rêxistinên mirovî hate kirin ku piştgiriya beşa perwerdeyê bikin.
Rêveberiya kampa Eyn Îsa ji bo ku mafê xwendinê yê zarokan, bi cih bîne di nava hewldanan de ye.
Bi wê armancê rêveberiya kampê dibistanek li kampê vekir. Niha bi hevkariya rêxistinên ku li kampê kar dikin û ji bo pêşwazîkirina zarokan dibistanên din vedike.
Hejmara xwendekarên dibistanên kampa Eyn Îsa 2 hezar û 960 e. Temenên wan di navbera 6-12 saliyê de ne
Materyalên ku li dibistanên kampê tên belav kirin, materyalên dibistanên Reqayê ne û li dibistanên ku rêxistinan vekirine, materyalên navneteweyî ne.
Têkildarî mijarê Endamê Rêveber ê Kampa Eyn Îsa Celal El-Eyaf wiha got: "Zarok li dibistanên kampê hatin bi cih kirin. Wek rêveberiya kampê me hewl ku zarok ji mafê xwendinê bê par nemînin."
Di dawiyê de El-Eyaf bang li rêxistinên mirovî kir ku piştgiriya beşa perwerdeyê bikin û navendeke tenduristiyê li dibistanên kampê vekin û her wiha pêdiviyên dibistanê bi cih bînin…*ANHA*

Şaredariya Minbicê lez daye xebatên xizmetguzariyê

Di çarçoveya amadekariyên demsala zivistanê de, Şaredariya Gel a Minbicê ji bo rêgirtina li ber kombûna ava baranê û paqijkirina rogaran, li kêleka projeyên xwe lez daye xebatên pêşwazîkirina zivistanê.
Ekîbên xizmeguzariyê yên girêdayî Şaredariya Gel a Minbicê bi derfetên heyî bi gelek porjeyan (riya Cizîrê ya nêzî Çerxeriya Jin, riya Geliyê Elsêl, rogarên li taxên riya Heleb û avakirina kolana Komeleya Cotkaran,… hwd) rabûne.
Di werşeyên Şaredariya Gel a Minbicê de bi dehan karkerên pispor hene. Komîteya wê ya giliyan jî daxwazên welatiyan li gorî derfetên xwe bi cih tîne.
Şaredariya Gel a Minbicê ji bo paqijiya bajar li ser du danan komîteyên xwe dixebitîne. Di her danekê de 15 werşe hene. Di her werşeyekê de erebeyek paqijiyê, ajokarek û 4 karkerên paqijiyê dixebitin. Karker jî li hemû taxên bajêr digerin û copa bajar jî li pişta geraca Minbicê kom dikin.
Pişt re erebeyên şaredariyê wê çopê vediguhêzin bakurê Minbicê û li nêzî xeta El Sacûr tê şewitandin.
Di vê derbarê de karkerên paqijiyê xemsariya şêniyên bajêr rexne dikin ku çopê navêjin cihên pêwîst.
Şaredariya Gel a Minbicê ji bo rohnîkirina riyan jî di beşa ceyranê de barekî mezin hilgirtiye ser milên xwe. Li gorî xebartkaran, di wê beşê de tevî 4 alavên xizmetguzariyê 4 karker jî dixebitin. Di vê derbarê de karmendên ceyranê eşkere kirin ku di rojên pêş me de hemû projeyên wan ên ceyran û rohnîkirina riyan bi dawî bibin…*ANHA*

RAMANÊ RÊBERTIYÊ

Hevjiyana Azad -2-

Abdulah Ocalan

Em dema vî hukmê xwe gerdûnî bikin, em dikarin dualîteya enerjî-maddeyê ji xwe re bikin bingeh. Enerjî li gorî maddeyê bêhtir bingeh e. Madde bi xwe enerjiya pêkhatî ye. Madde şêweyê bi formbûyî yê hebûn û veşartina enerjiyê ye. Madde bi vê xisleta xwe enerjiyê dixe qefesê û herikîna wê dicemidîne. Her forma maddeyê para xwe ya enerjiyê cuda ye. Jixwe ev cudahiya enerjiyê cudahiya form û avahiyên maddî diyar dike. Enerjiya di form û maddeya jinê de ji enerjiya di maddeya mêr de cuda ye. Enerjiya jin hildigire hem zêde ye, hem jî xisleta enerjiya wê cuda ye. Forma jinê rê li ber vê cudabûnê vedike. Di xwezaya civakî de enerjiya mêr a vediguhere mekanîzmayên desthilatdariyê, bi form û şêweyên maddî bi gewde dibe. Şêwe di tevahiya gerdûnê de weke enerjiya cemidî muhafezekar in. Di civakê de serwerbûna mêr, şêweyê desthilatdariyê ye. Di vê rewşê de enerjiya hildigire bi giranî bûye xwedî form. Enerjiya venaguhere formê gelekî kêm e, û li cem kêm kesayetan pêk tê. Enerjiya li cem jinê bi giranî nabe form û şêwe nagire. Enerjiya wê di rewşa xwe ya herikînê de dimîne. Di form û qefesa mêr de neyê girtin wê weke enerjiya jiyanê herikîna xwe dewam bike. Jêhatîbûna manedanê, helbestwarîtî û xweşiktiya jinê ya nehatiye cemidandin û hişkkirin, bi vê rewşa enerjiyê ya giraniya xwe heye, ji nêz ve têkildar e. Ji bo serwextbûna li vê rastiyê divê mirov hûrûkûr li jiyana zindî û ruhberan serwext bibe.
Beridîna jiyaneke ku digihêje heta bi jiyana mirovî heye, ev jiyan dikare qismî were terîfkirin yan jî dive were terîfkirin. Beriya her tiştî divê mirov armanca jiyanê bixe ber lêpirsînê. Em çima hene, em çima dijîn? Jiyan çima xwe dewam dike, xwe xwedî dike û bergiriya xwe dike? Eger mirov bibêje, ji bo jiyanê xwe xwedî dike, bergiriya xwe dike û xwe zêde dike, ev ji bo bersivê têrê nake. Ji van pirsan wêdetir pirs hene, ew jî ev in, em çima zêde dibin, em çima bergiriya xwe dikin. Eger em bersiva 'ji bo jiyanê' bidin, em ê pê li dora singê xwe bizîvirin. Eger mirov li dora singê xwe jî bizîvire ev nabe çare û bersiv. Astên zêhniyetê yên heta destpêka mirov weke şêweyekî enerjiyê bi beridîn û pêşketinê hatine, ji bo diyardeya têgihiştinê hinek nîşaneyên bersivê didin. Beridîna gerdûnê heta bi destpêka mirov hêzeke maneyê ya timî hewl dide bi pêş bikeve nîşan dide. Potansiyela rastî yan jî veşartî ya di gerdûnê de mîna ku timî dixwaze derkeve holê, fêhm bike û bê fêhmkirin fena li encamekê bigere. Pêdiviya fêhmkirin û hatin fêhmkirinê, ajoya bingehîn a gerdûnê ye. Ji vir û pêve pirsa divê mirov bike, wê der barê fêhmkirin û hatin fêhmkirinê de be. Tişta dixwaze fêhm bike û bê fêhmkirin çi ye? Di Pirtûka Pîroz de "Xwedê dibêje, ez sirrek bûm, ji bo bêm naskirin û zanîn, min gerdûn afirand." Ev hukmê Xwedê der barê xwe de dayî belkî ji bo me bibe bersiv, lê têrê nake. Pêdiviya bi zanîn û naskirinê bi temamî têra danasînê nake. Lê mîna ku hinekî sirra jiyanê eşkere dike.

Kooperatîf aboriya komînal pêş dixe

Jinên bakurê Sûriyê di xebatên kooperatîf û komînan de cihekî girîng digirin û bi awayekî çalak tevlê dibin. Kooperatîfa Destkar ji aliyê Desteya Aboriya Xweser ya bajarê Hesekê ve hatiye vekirin. Di vê kooperatîfê de 10 jin cih digirin. Jin bi rêya van kooperatîfan aboriya xwe pêş dixin.

Jinên bajarê Hesekê bi riya kooperatîfan Aboriya xwe geş dikin.
Kooperatîfa Destkar ji aliyê Desteya Aboriya Xweser ya bajarê Hesekê ve hatiye vekirin. Di vê kooperatîfê de 10 jin cih digirin.

KOOPERATÎF WEKHEVIYÊ AVA DIKE

Rêvebera Kooperatîfê Şanê Îsmayîl diyar kir ku bi riya koopmperatîfan mirov ji ezeziyê xelas dibin û got; "Kooperatîfvanî pir xweşe, bi rih û hezkirin em bi hev re kar dikin. Di kooperatîfan de komîte hene, komîteya kirrînê, çêkirinê û firotinê. Em salçeya îsotan, penêr, zeytûn, reçela tirî, kundir û miloxiyê çêdikin û difroşin."
Şanê bal kişand ser xebata jinan a di kooperatîfan de û wiha dewam kir; " Ez dixwazim jin tevlî karê kooperatîfan bibin. Ji bo ku em civakeke xwedî exlaq û polîtîk û dûrî ezeziyê ava bikin. Divê ku em bikaribin bi rêya kooperatîfan çanda baviksalarî ji civaka xwe rakin û civakeke li ser wekheviya jin û mêr ava bikin."

HILBERÎN KAREKÎ XWEŞ E

Jina bi nav Şêrîn Ehmed ku ew jî ji Helebê ye û li heman kooperatîfê dixebite diyar kir ku çanda koomperatîfan çandek pîroz e û wiha got; "Ez ji Helebê hatime. Despêkê min kesek nas nedikir ,rewşa min ya aborî pir lewaze û zarokên min jî hebûn. Lê piştî ku tevli vê kooperatîfê bûm û rewşa min a aborî baş e û ji karê xwe jî gelek hez dikim. Hilberîna bi destan pir xweş û paqij e, dema me dest bi kar kir û cîran jî alîkariya me kir me dît ku di navbera hilberîna bi destan û ya makîneyan de ferqeke mezin heye. Armanca me ew e ku jin kooperatîfan geş bikin û çanda ezeziyê ji holê rabikin."

EM Ê KAR BERFIREH BIKIN

Jina bi navê Fatma Ebid Eziz jî wiha axivî; "Ez ji Helebê me. Ji ber ewlehiyê min berê xwe da Hesekê. Ez pir kêfxweş bûm ku min cihê xwe di kooperatîfê de girt. Em hemû bi rIhê hevaltiyê tevdigerin û em ê wekî jin karê xwe berfirehtir bikin û di dema pêş de em ê firoşgehekê jî vekin. Di kooperatîfa destkar de her kes ji bo bi berpirsyarî dixebite."…*JINNEWS*

Şengal li pişta Efrînê ye

Jinên Êzidî yên Şengalê dagirkirina Efrînê şermezar kirin û diyar kirin ku Şengal li pişta Efrînê ye. Dewleta Tirk piştî ku Efrîn dagirkir niha bi her awayî kiryarên li dijî mirovî li ser gelê Efrînê pêk tîne. Her wiha çand û dîroka Efrînê tune dike. Jinên Êzidî yên li Şengalê bertek nîşanî dagirkeriya dewleta tirk dan û gotin ku ew ê heta dawiyê li pişt Efrînê bin û Efrînê ji dagirkeran rizgar bikin.

EM Ê PIŞTGIRIYA BERXWEDANÊ BIKIN

Jina bi navê Amşê Reşo wiha got: "Em wêkî jinen Êzidî heya dawiya jiyana xwe bi gelê Êfrînê re ne. Bila dijmin baş bi zanibe ku em ti carî dev ji Efrîna rengîn bernadin. Çawa me nedixwest ferman bi ser kurdên Êzidî de bê me nedixwest ku ferman bi ser gelê Efrînê de jî were. Em timî li cem gelê Efrînê ne. Gelê Efrînê li ber xwe dide û em ê jî piştgiriya vê berxwedanê bikin."

EM Ê ÊRÎŞAN TÊK BIBIN

Jina bi navê Amşê Silêman jî wiha got: "Ez di serî de berxwedana Efrînê piroz dikim. Ev nêzî salakê ye li ber xwe dide. Li gel ku dewleta tirk bi heman awayi erişî Efrin dike lê heta roja iro ti kesi li hember van êrîşan dengê xwe nekiriye. Lê em weke dayikên Êzidî diyar dikin ku em van êrîşan qebûl nakin û em ê bedeng nemînin. Bila dewleta tirk baş bizanibe ku em dayik em ê êrîşên wan têk bibin. Tu hêz nikare me têk bibe."…*JINNEWS*

Piştî şoreşê me armanca Rêber Ocalan nas kir

Dayika Şemsa Ismaîl bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re maye. Dayika Şemsa destnîşan kir ku tevî girtina wî ji aliyê dewleta Tirk ve, lê gel li ser rêgez û felsefeya wî dimeşe. Şemsa diyar kir ku fikrên Ocalan di hişê wan de mayînde bûne.
Dewleta Tirk tecrîdeke giran li ser Rêber Ocalan pêk tîne. Malbat û parêzer nikarin bi Rêber Ocalan re hevdîtinê bikin. Ji aliyê din ve nerazîbûn û çalakiyên li dijî tecrîdê jî zêde dibin.
Dayika Şemsa Ismaîl a ji Girê Spî yek ji wan kesan e ku bi Rêber Ocalan dîtiye û bi wî re rûniştiye. Dayika Şemsa hevdîtina xwe bi Ocalan re wek xewnekê pênase kir. Dayika Şemsa wiha got: "Di sala 1990'î de ez bi Rêber Ocalan re rûniştim. Di wê demê de li Lubnanê bû. Tevî gelek malbatan em çûn serdana Ocalan. Tevî gelek zehmetiyên rê lê em ji bo hevdîtinê bi israr bûn."
Dayika Şemsa destnîşan kir ku beriya hevdîtinê ew gelek bi heyecan bû û ji kêfan dilerizî. Dayika Şemsa diyar kir ku Rêber Ocalan gelek caran bi wan re civiyaye û wiha got: "Di nîqaşên xwe de Ocalan behsa çawaniya rizgariya gelan ji pergalên desthilatdariyê yên ku cihanê hikum dikin û her wiha çawa jin azadiya xwe bi dest bixin, dikir."
Dayîka Şemsa destnîşan kir ku Rêber Ocalan di civînan de her tim behsa mijara azadiya jinan dikir û her tim ev gotin dubare dikir: "Jina azad tê wateya civaka azad."
Dayîka Şemsa wiha dewam kir: "Wê demê mebesta Rêber Ocalan ji vê gotinê em tê negihiştin, lê niha piştî şoreşa jinan a Bakurê Sûriyê me nû mebesta Ocalan nas kir."
Dayika Şemsa têkildarî tecrîdê jî wiha got: "Dewleta Tirk bi tecrîdê dixwaze vîna gelên ku bi Ocalan bawer kiriye, bişikîne lê em gav paşde navêjin û em ê rêya azadiyê berdewam bikin."…*ANHA*

Zewaca bi temenê biçûk qetilkirina zarokan e

YJC'a bajarê Hesekê bi daxuyaniyekê zewaca zarokan şermezar kir û diyar kir ku zewca zarokan qetilkirina zarokan e. Yekîtiya Jinên Ciwan (YJC) bi armanca şermezarkirina zewaca bi temenê biçûk daxuyaniyek li ber navenda Yekîtiya Ciwanên Rojava da. YJC'ê di daxuyaniya xwe de bal kişand ser xeteriya zewaca zarokan û diyar kir ku ew zewaca di temenê biçûk de şermezar dikin û ew ê heta dawiyê li dijî vê zewacê têbikoşin.
Di daxuyaniya ku hat dayîn de Endama YJC'ê Dîlber Ehmed xwend û wiha got: "Zewaca di temenê biçûk de qetilkirina zarokan e. Zewaca zarokan li Kurdistan û bakurê Sûriyê pirsgirêka civakê ya sereke ye. Em wekî jinên ciwan ji Zewaca di temenê biçûk de ku tê kirin re dibêjin na. Di zewacê de ger vîna kesên ku dizewcin li ber çav neyê girtin ew zewac têkçûn e. Em vê zewaca di temenê biçûk de şermezar dikin û heta dawiyê em ê li dijberî wê têbikoşin."

Şervanên jin jiyanê waterdar dikin

Şervanên YPJ'ê yên ku li eniyên pêş ên Pêngava Bagera Cizîrê ya tinekirina şerê terorê cih digirin, şer û jiyanê bi watetir dikin.
Şervanên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ên li eniyên pêş ên şerê Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê 'Tinekirina Şerê Terorê' cih digirin, mohra xwe li cengê dixin. Şervanên YPJ'ê li gel şer jiyanê jî ewqas bi wate dikin… Şervanên YPJ'ê yên li Gundê Baxozê li eniyên pêş cih digirin diyar dikin ku armanca wan jiyaneke wekhev azad a nû avakirine.
Şervana YPJ'ê Welatcan Efrîn diyar kir ku wek tabûra çekên giran wan jî cihê xwe di pêngava qonaxa dawî ya Bagera Cizîrê de girtiye û bi çekên xwe hem derbên xurt li çeteyan didin hem jî parastina hevrêyên xwe dikin. Efrîn got: "Di şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê de rola şervanên jin pir e û bi wate ye." Welatcan Efrîn diyar kir, armanca wan a çek rakirinê ne tenê gule teqandin e, armanca wan tinekirina hişmendiya bi sedê salan a qirkirin û qetilkirinê ye.

Hevdîtinên bi rêjîmê re negihiştiye encamê

Hevseroka MSD'ê Emîna Umer di konferansa Yekîtiya Mamosteyan a Tepqayê de axivî û rewşa Sûriyê û hevdîtinên bi rêjîmê re nirxand. Emîna Umer got, "Hevdîtinên me bi rêjîmê re didomin lê heta niha negihiştiye encamê." Emîna diyar kir ku hevdîtinên navnetewî yên ku nunerên Bakurê Sûriyê neyên beşdarkirin encamên wê, wan eleqedar nakin.

Hevseroka MSD'ê Emîna Umer anî ziman ku hevdîtinên ku nunerên Bakurê Sûriyê neyên beşdarkirin encamên wê, wan eleqedar nakin û destnîşan kir ku hevdîtinên wan ên bi rêjîmê re berdewam e, lê heya niha negihiştiye encamekê.
Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk Emîna Umer di konferansa yekemîn a mamosteyên herêma Tebqayê de axivî.
Emîna Umer rewşa siyasî û rewşa Sûriyê nirxand û bal kişand li ser hevdîtinên MSD û rêjîma Sûriyê.
Emîna Umer anî ziman ku, giraniya hevdîtinên wan, li ser mijarên xizmetguzarî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û hewldanên MSD'ê ku Sûriyê veguherîne, dewleteke ne navendî pirreng e û wiha got: "Em ji aliyê rêjîma Sûriyê ve hatin vexwendin, me vexwendina wan bi cih anî, li ser vê yekê me şandeyek ji 5 kesan ava kir, , nûnerên herêmên Tebqayê di nav wan de hene. Şande çû Şamê û bi rayedarên rêjîmê re hevdîtin kirin. Di hevdîtinan de mijarên xizmetguzarî, destur û têkiliyên pêşerojê yên di navbera herdu aliyan de gotûbêj kirin."
Emîna Umer, diyar kir ku heya niha ti lihevkirin di navera wan û rêjîmê de pêk nehatin û wiha dewam kir: "Tenê tîfaq li ser avakirina komîteyeke hevbeş ji bo şopandina sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û qanûna rêveberiya herêmî hatin kirin. Her wiha lihevkirina li ser berdewama diyalogan çêbû. Komîteyek ji aliyê MSD'ê ve ji 7 kesan ji hiqûqnas û nunerên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hate avakirin û li ser hevpeyamana civakî, sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk lêkolîn kirin û çûne Şamê, li wir hevdîtinên berfireh pêk anîn û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û qanûna herêmî hatin nîqaşkirin, lê heya niha em negihiştine encamê."
Emîna Umer mijara Idlibê nirxand û wiha got: "Tirkiye, Rûsya, Îran û rêjîma Sûriyê ji bo Idlibê destwerdan dikirin. Rûsiya û rêjîma Sûriyê dixwestin şer pêk were. Îran

jî ev yek dixwest. Tirkiyê muhlet da Cebhet El-Nusra, lê ji ber ku nedikarî wê îqna bike, ew xist lîsteya terorê."
Emîna Umer destnîşan kir ku civaka navdewletî û koalîsyona navdewletî zext li Rûsya kirin da ku şer li Idlibê dernekeve.
Hevseroka MSD'ê di anî ziman ku gelek aliyan hêviyên xwe spartibûn civîna Tehranê û got: "Belê welatên girantor ên Astanayê li Tehranê civiyan, ji cîhanê re diyar kir ku ew li hev nakin. Lê pişt perdeyê rewş cuda ye. Di roja din de, niyeta van dewletan eşkere bûn, Îran hejmarek mûxalifên hindirîn darve kir, di heman demê de baregehên partiyên siyasî yên muxalif bombebaran kir."
Hevseroka MSD'ê Emîna Umer, di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Hemû hevdîtinên navdewletî, heger li Cinêv, an Astana, yanî jî deverek din be, MSD neyê beşdar kirin encamên wê, wan eleqedar nake."

Îdlib êdî beşeke Tirkiyê ye

Aldar Xelîl destnîşan kir ku avakirina kembera ewlehiyê li derdora Idlibê ku di encama lihevkirina Tirkiye û Rûsyayê de pêk hatiye, dibe ku wek sînorekî nû di navbera Sûriye û Tirkiyê de be. Xelîl diyar kir ku êdî Idlib bûye beşek ji Tirkiyê û da zanîn ev pêngav temamkirina projeya Erdogan a Sûriyê ye.
Siyasetmedar Aldar Xelîl derbarê pêşketinên dawî yên li Sûriyê û bi taybet di derbarê rewşa Îdlibê de ji ANHA'yê re axivî.
Aldar Xelîl diyar kir ku destwerdana Tirkiyê ya li Sûriyê hişt mijar bêtir girêkok û aloz bibin û wiha got, "Tirkiye sedema sereke ya dirêjbûna aloziya Sûriyê ye û komên terorîst û çeteyan li seranserî Sûriyê belav dike. Tirkiye sedema sereke ya êş û trajediya gelê Sûriyê ye. Di encama siyaseta Tirkiyê ya ku Erdogan serkêşiya wê dike hişt ku komên çete li herêmên Sûriyê bêne belavkirin û bandora xwe li çarenûsa danûstandinên li Sûriyê û hevsengiya hêzên li Sûriyê ne kir."
Xelîl aloziya li dora Îdlibê jî nirxand û wiha dewam kir, "Tişta niha herî zêde girîng mijara rewşa Idlibê ye. Aloziya Idlibê piştî gavên ku Erdogan avêtine pêk hat, bi taybet dest ji bajarê Helebê berda û radestî rêjîmê kir û alîkariya rêjîmê kir da ku serweriya xwe li ser Xutaya Şamê ferz bike û rasterast destwerdana Cerablûs û Babê kir. Niha hêzên girêdayî wî, milîs û komên terorîst li Idlibê sedema sereke ye ku hişt Rûsya xwe bispêre wî û beriya wê jî civîna sêalî ya Rûsya, Tirkiye û Îranê li dar xistin da ku vê mijarê zelal bikin. Lê civîna sêalî li gorî daxwaza Tirkiyê û daxwaza Rûsyayê bê encam bû û ji ber vê yekê civîneke dualî di navbera Pûtîn û Erdogan de pêk hat."

Xelîl destnîşan ki rku civîna di navbera Pûtîn û Erdogan de, civîna parvekirina berjewendiyan û planên mehên pêş de bû û got, "Erdogan di rewşeke dijwar de ye, yan wê dest ji Idlibê wekî Helebê berde û bi vê yekê wê komên girêdayî xwe yên di Sûriyê de winda bike, yan jî wekî Îranê wê israr bike û operasyona Îdlibê rawestîne. Rûsyayê mijar bi baldarî lêkolîn kir û xwest helwesta gelek dewletan nas bike. Piraniya dewletên din jî ji ber gelek sedeman nexwestin mijara Idlibê dijwartir bibe. Sedema sereke gefên Erdogan ji dewletên Ewropayê re, gotiye ;eger Idlib rastî êrîşekê were dê komên terorîst ber bi Ewropa û hin dewletên din ve bişîne. Ji ber van gefên Erdogan metirsiyên van dewletan zêde bûn."
Aldar Xelîl diyar kir ku bi peymana di navbera Erdogan û Pûtîn de Îdlib buye beşek ji Tirkiyê wiha pê de çû, "Komên terorîst nexwest ji Idlibê derkevin û ji bo şerê di hundirê Idlibê de bi israr bûn. Her wiha ji ber bertekên hêzên navnetewî ji Erdogan Pûtîn razî kir da ku operasyonê dereng bixe û hevpeymanekê ji bo avakirina kembereke ewlehiyê ava bike. Bi vê yekê êdî Idlib bûye beşeke ji Tirkiyê û ev kembera ewlehiyê jî sînorê nû di navbera Sûriye û Tirkiyê de ye. Ev yek temamkirina projeya Erdogan e ku li Cerbalûs û Babê dest pê kir û niha li Efrîn û Idlibê didomîne. Herêmên di bin serweriya Tirkiyê de êdî ne girêdayî Sûriyê ne."
Aldar Xelîl bandora peymana di navber Tirkiye û Rûsyayê ya Îdlibê li ser Efrînê jî nirxand û ev tişt anî ziman, Ev hevpeyman beriya her tiştî wê derfetê ji komên çete re peyde bike da ku xwe ji nû ve bi rêxistin bikin, wê hin alîgirên xwe derbasî Efrînê bikin û dê bandoreke neyînî li demografyaya Efrînê bike."
Xelîl da zanîn ku divê xebatên ji bo rizgarkirina Efrînê bêne zêdekirin û wiha axivî, "Bêyî rizgarkirina Efrînê ne pêkan e behsa Sûriyeke xwedî serwerî were kirin û ne pêkan e behsa Bakurê Sûriyê yê demokratîk û azad were kirin. Ne pêkan e behsa Rojavaya azad were kirin. Ji bo me mijara rizgarkirina Efrînê stratejîk e û naveroka bingehîn a hemû nîqaş û hevdîtinên me bi hemû aliyên din re ye. Rizgarkirina Efrînê û peydekirina çareseriya aloziya Sûriyê girêdayî hevûdu ne. Qonaxeke dijwar li pêşiya me ye, destwerdan zêde bûne û alozî dijwartir bûne. Ji ber vê yekê Sûriye hê jî di nava aloziyeke dijwar de ye û çareserî hê jî dûr e."

Şerê Serokomariyê yê YNK û PDK'ê

Berdevkê PDK'ê diyar kir ku YNK'ê bê agahdarkirina wan Berhem Salih ji bo serokkomariyê diyar kiriye û got; "Me ji YNK'ê re gotiye ku em wî serokkomariyê mafê xwe dibînin. Wê namzetê me ji bo wê hebe."
YNK'ê roja 19'ê Îlon li Silêmaniyê piştî civînê ragihand ku namezetê wan yê serokkomariya Iraqê Berhem Salih e.
Berdevkê PDK'ê Mehmud Mihemed li ser namzetnîşandana Berhem Salih ji bo serokkomariya Iraqê ji aliyê YNK'ê ve daxuyaniyek nivîskî weşand.
Mehmud Mihemed di daxuyaniya xwe de diyar kir ku wan dixwest weke çawa ku li gel YNK'ê bi yekgirtin çûne Bexda, bi heman şêweyî namzetê wan ji bo serokkomariyê hebe û got; "Me ji wan re gotiye ku em serokkomariyê mafê xwe dibînin."
Mihemed wiha dewam kir; "Piştî me ji YNK'ê re got li gorî encama hilbijartinê em serokkomariyê mafê xwe dibînin, biryar bû YNK piştî civîna polîtburoyê bersiva me bide. Belê bê bersiva me bidin, yek aliyane Berhem Salih ji bo namzetiya serokkomariyê diyar kirin."
Di dawiyê de Mihemed ev tişt got; "Weke PDK me ragihandiye ku serokkomarî para gelê Kurdistanê ye. Nabe ti aliyek bi tenê weke mafê xwe bibîne. Ji bo serokkomariyê weke PDK wê namzetê me jî hebe."
Biryare di 25'ê Îlonê de parlamentoya Iraqê ji bo diyarkirina namzetê serokkomariyê bicive. Li gorî lihevkirinên siyasî ev postê serokkomariyê ji bo Kurdan e. Di sê demên borî de ev post di destê YNK'ê de bû. Belê niha di navbera PDK û YNK'ê de ji bo wergirtina serokkomariyê pêşbaziyek heye û heya niha negihiştine ti encamekê…
ROJNEWS

Ew ê krîz li Tirkiyê zêdetir bibe

Berdevkê HDP'ê Sarûhan Olûç bangî Erdogan kir û got, "Ji ber ku tu dizanî, tu yê li ser sindoqan bi ser nekevî, niha jî tu dixwazî Saziya Bilind a Hilbijartinê têxe meriyetê."
Berdevkê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Sarûhan Olûç têkildarî rojeva civîna Desteya Rêveber a Navendî daxuyanî da.
Olûç di heman demê de ji ber salvegera wefatî Mûsa Anter jî bi bîr anî. Olûç qala krîza siyasî û ekonomîk kir û got, "Li Tirkiyê a niha şîrketên herî mezin jî konkordatoyê îlan dikin. Bawerî şikestiye û psîkolojiya krîzê zêdetir bûye. Gelo heke krîz tune, we çima bihayê hemwelatiya 1 milyon dolar kirin 250 hezar dolar? Ji ber ku pêdiviya we bi dolaran heye. Ji ber ku divê heta salekê Tirkiye 220 milyon dolaran deyn bide. Vê aboriya li ser deynan rê li ber bilindbûna dolaran vedike. Gelekî eşkere ye ku di mehên pêş me de ew ê krîz zêdetir bibe. Dewlet divê dev ji kirîna balefiran berde. F35'an nekirin, S400'an nekirin, lêçûnên şer kêm bikin."

HILBIJARTINÊN HERÊMÎ

Olûç qala amadekariyên hilbijartinên herêmî jî kir û got, "Me dest pê kir ku em modela xwe ya rêveberiyên herêmî baş amade bikin. Piştre em ê qala namzetbûnê bikin. Hedefa me ev e ku em şaredariyên ku qeyûm li ser wan hatiye ferzkirin, paş ve bistînin û li cihên din 10,15 şaredariyên din qezenc bikin. Ji bo têkbirina koalîsyona AKP-MHP'ê em ê li bajar û navçeyên li rojavayê Tirkiyê piştgiriyê bidin mûxalefeta meşrû ya li wê derê. Ji ber ku Erdogan tu dizanî, tu yê li ser sindoqan bi ser nekevî, niha jî tu dixwazî Saziya Bilind a Hilbijartinê têxe meriyetê û dixwazî namzetên HDP'ê veto bikî."

Li dijî DAÎŞ'ê û MÎT'ê operasyon

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku 19'ê Îlonê Hêzên Antî Teror ên Asayîş, YPG û YPJ'ê li dijî hucreyên çeteyên DAÎŞ'ê û artêşa Tirk ên li gundê Qûbbê û Ceddê yên navçeya Şêxler a Kobanê operasyoneke hemwext kirine. Di operasyonê de bi dehan çete hatin girtin û rêjeyek çek hate desteserkirin.

Bi tevlîbûna HAT Asayîş, YPG û YPJ'ê li dijî hucreyên çeteyên DAÎŞ'ê û artêşa Tirk ên li Kobanê operasyonên hemwext hatin kirin.
Di operasyonê de bi dehan çete hatin girtin û rêjeyek çek hate desteserkirin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku 19'ê Îlonê Hêzên Antî Teror ên Asayîş (HAT Asayîş), YPG û YPJ'ê li dijî hucreyên çeteyên DAÎŞ'ê û artêşa Tirk ên li gundê Qûbbê û Ceddê yên navçeya Şêxler a Kobanê çalakiyeke hemwext kirine.
Navenda YPG'ê têkildarî çalakiyê ev agahî parve kir:
"Li navçeya Şêxler a ku dikeve başûrê rojavayê Kobanê, di roja 19'ê Îlonê de bi operasyonên hevbeş yên hêzên me YPG, YPJ û yekîneyên Asayîşê, hucreyên razayî yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker û DAÎŞ'ê hatin bêbandorkirin.

OPERASYONEKE TAYBET Û HEMWEXT

Çeteyên dewleta Tirk a dagirker û DAÎŞ yên ku hewl didin rewşa aram û ewle ya li Bakûrê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê qels bikin, bi armanca pêkanîna xebatên terorê xwe di herêmê de bi awayekî nepenî rêxistin dikin. Bi vê armancê gelek komên çete yên ku ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê û dewleta Tirk a dagirker ve hatiye avakirin, xwe di nav gelê me yê sîvîl de vedişêrin. Li Kobanê, ev komên ku pêwendiya xwe bi MÎT û DAÎŞ'ê re hene û ev demeke ku di bin çavdêriya hêzên ewlehiyê de bûn, bi operasyonek taybet ya hevbeş ya hêzên Asayîş û hêzên me ve hatin bêbandorkirin.

BI DEHAN ÇETE HATIN GIRTIN

Di 19'ê Îlonê de li gundên Qûbbê û Ceddê yên girêdayî navçeya Şêxler a ser bi bajarê Kobanê ve, li hember van çeteyan ji aliyê hêzên me, yekîneyên Asayîşê û Hêzên Asayîşa Taybet (HAT) ve operasyonên hemwext hatin lidarxistin. Di encama operasyonên serkeftî de bi dehan çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker û DAÎŞ hatin girtin.

ÇEK Û CEBILXANE HATIN DESTESERKIRIN

Di encama lêgerînan de mîqdarek zêde amûrên teqemenî yên ku ji bo êrîşên bombeyî dihatin amadekirin, 2 çekên B-7 roketavêj û 10 guleyên wê, 11 çekên AK-47, 2 dûrbînên şevê, 4 dûrbînên roj, 14 telefon, 4 destik, 9 tabanca û guleyên wê li gel cûr be cûr amûrên leşkerî û muhîmmat hatin desteserkirin."

Ji bo meşên 22'yê Îlonê bang hat kirin

Platforma 'Erdogan not welcome' bang kir ku her kes tevlî meşên 22'yê Îlonê bibe.
Platforma 'Erdogan not welcome' daxuyaniyeke nivîskî da, got, dîktator Erdogan ê ku dijminê gelên Kurdistan, Tirkiye û cîhanê ye, dîktatoriya xwe didomîne.
Platforma 'Erdogan not welcome' got Erdoganê dîktator û tifaqa wî ya faşîst zextê li ser akademîsyen, nûçegihan, rewşenbîr, sendîkavan, rêxistinên civaka sivîl ên Kurdistanê û Tirkiyê, dike û wiha dewam kir: "Ji bo tinekirina hemû nasname û baweriyan rêbazên qirêjî bi kar bîne, her wiha polîtîkayên şer û komkujiyê dixwaze li derveyî sînorên Tirkiyê jî bidomîne. Piştî dagirkirina Efînê û êrîşên ser Rojava niha jî êrîşê dibe ser Başûrê Kurdistanê û berê xwe daya dagirkirinê. Ev armancên dewleta Tirk ku bi fînansekirin û xwedîkirina çeteyên mîna DAÎŞ'ê dixwaze şer li Rojhilata Navîn belav bike, ji hêla Hêzên Sûriya Demokratîk ve hatine têkbirin.
Dîktator Erdogan û tifaqa wî ya faşîst ku ji têkçûnê dersan nastîne, êdî vî şerê qirêj bi rengekî vekirî û rasterast bi rê ve dibe.
Ev şerê qirêjî û polîtîkayên wî ji hêla raya giştî ve hatiye dîtin, ji hêla demokrat, pêşverû û alîgirên wekheviyê ve bi çalakiyan hatiye protestokirin. Di serî de Elmanya gelek hikûmet û saziyên navnetewî ku guhê xwe ji van protestoyan û helwestan re girtine bi bêdengiya xwe destekê didin van polîtîkayên qirêj û şer.
Welatên Ewropayê ji bo peymanên qirêj yên bi TC'ê re, ji bo berjewendiya firotina çekan û aboriyê, nirxên mirovahiyê binpê dikin.
Elman ku bi firotina tang û amûrên şer destekê dide şerê qirej, qîma xwe bi vê jî neaniye, 28-29'ê Îlonê Erdoganê dîktator vexwendiye Elmanayê. Dewleta Elman bi vexwendina Erdogan, nirxên mirovahiyê û wijdana mirovahiyê binpê kiriye. Lê Elmanya li şûna ku bi merasîma leşkerî Erdogan pêşwazî bike, divê bi wê ristê rabe ji bo ku dîktator Erdogan ê ku sûcê şer kiriye, li dadgehê navnetewî were darizandin, hewl bide.
Em saziyên Elman, Kurdistanî û Tirkiyeyî, bi platforama bi dirûşma 'Erdogan not welcome' 22'yê Îlonê em ê li eyaletan dîktator Erdogan ê ku dijminê demokrasiyê ye bi meşan şermezar bikin.
Banga me li partiyên siyasî, sendîka, rêxistinên civaka sivîl, tevgerên aştiyê, hemû şoreşger û demokratan ew e ku 22'yê Îlonê tevli meşên li bajaran bibin û li dijî dîktator Erdogan, em bloka demokrasiyê û wekheviyê bi çalakiyên hevpar dengê xwe bilind bikin."

HSM bi welatiyên Minbicê re civiya

Endamên Partiya Sûriya Pêşerojê bi welatiyên gundê Eseliya yê Minbicê re civiya û partî bi wan dane nasîn.
Bi armanca pênasekirina partiyê û armancên wê, endamên Partiya Sûriya Pêşerojê bi welatiyên gundê Eseliyê yê herêma Minbicê re civiyan. Bi dehan şêniyên gund di civînê de amade bûn.
Di civînê de Endamê Partiya Sûriya Pêşerojê Mustefa Hengorî axivî.
Hengorî anî ziman ku pêwîste dawî li aloziya Sûriyê ku gel gelek ziyan jê dît were anîn û got: "Me ev partî ava kir, da ku bibe bingeha çareseriyê."
Endamê Partiya Sûriya Pêşerojê Îbrahîm El-Maşî jî axivî û diyar

kir ku armanca partiyê ew e ku xizmeta welatiyan bike û rola jin û ciwanan di civakê de pêş bixe.
El-Maşî diyar kir ku ew jî diyalogên çareserkirina aloziyê û avakirina pêşerojeke demokratîk re vekirîne.
Endama Buroya Rêxistina Jin a partiyê Nêrmîn Muslim jî axivî û desnîşan kir ku ew piştgiriyê di-din rol û têkoşîna jinan û wiha got: "Em piştgiriyê didin avakirina civakeke azad, rêgirtina li ber tundiya li ser jinan û pêkanîna wekheviya di navbera jin û mêr de."

Ker û Gizer; Dewleta Tirk û çete

Mihemed SEYDÎ

Li başûrê Sûriyê dewleta Tirk hesabên pir mezin li ser dikirin. Wê texmîn dikir ku şerekî dem dirêj li wir derbikeve û hêzên koalîsyonê û Rûsiya werin beramberî hev. Ew jî wê ji bo wê bibiya zemînek ku dagirkeriya xwe li bakurê Sûriyê qewîm bike, komên çete li gorî xwe eyar bike , artêşeke çeteyan ji hemû koman avabike û li ser navê wan ku qaşo mixalîfete bazariyan bike. Lê beriya ku başûrê Sûriyê bikeve rojevê serokê Emerîka Donald Tramp û serokê Rûsiya Vladîmîr Pûtin li hilsînkiyê hatin gel hev û mijara Derai û derdora wê (başûrê Sûriyê) di nava xalên ku li ser lihevkiribûn. Xalên lihevkirina wan nehatin eşkerekirin. Lê piştî civînê Emerîka destê xwe ji Komên li wir kişan. Rûsiya ev herêm kontrol kir û gelek çeteyên li wir di çarçoveya guhertina demokrafîk û bazariyên di navbera Rûsiya, Tirkiyê û îran ku li astanayan pîlan kiribûn ber bi Efrîn û deverên bakurê Sûriyê ve hatin veguhestandin..
Li Idlibê bi hezaran çete hatine komkirin û yên herî zêde navê wan derketiye jî cibhet el-nusra û koma bi navê huras el-dîn yanî dergevanên olê ne. Ev kom bi piranî li Idlibê dimînin. Li deverên din ên ku dewleta
Tirk dagirkirine jî komên çete yên bi navên cûda hatin bi cihkirin. Rewşa Idlibê pişt ku lihevkirin li ser başûrê Sûriyê pêk hat ket rojevê û heta êdî li ber teqandinê bû û digotin ha îro operasyon destpêdike û ha sibê dest pê dike. Lê ew diyar bû ku wê destpêneke. ji ber dî warê navdewletî de mijar baş nepijiya ye. Ew daxuyaniyên ku her roj dihatin dayîn û gefên ku wê çekên kîmyawî werin bikaranîn, Bretaniya, Franca û DYE di bin wê hincetê de qale destwerdanekê dikirin ev yek dida ber çavan. Tevî ku hin caran didan xuyakirin ku li wir terorîst hene û divê herêm were paqijkirin.
Rewş li Idlibê niha bi hevdîtina serokê Rûsiya Pûtin û serokkomarê Tirk r.t. Erdogan rawestiya, û dewleta Tirk dîsa xwe avt bextê Rûsiya û ji bo operasyon neyê destpêkirin tewîz dan û mehek mihlet ji bo qanihkirina çeteyan stand.
Di rastiyê de gelek sedemên Rûsiya dest bi operasyonê neke hene. Yek ew bû ku ger Rûsiya berê xwe daba Idlibê wê êdî li ser çi siyaset bikira. Yanî niha Rûsiya bi riya Tirkiye zextê li NATO dike lê ger berê xwe daba Idlibê wê raste rast bihata beramberî NATO. Ya dûyem jî ihtîmala binketina rêjîmê di vî şerî de hebû ji ber hêjmara çeteyên dewleta Tirk li wir komkiribûn pir zêdebû û heta serçeteyan jî di daxuyaniyên xwe de qale êrişa li ser Helebê dikirin ger ku rêjîm ber xwe bide Idlibê. Ji vê tirsê jî Rêjîmê û Îranê hêzên xwe li rojavayê Helebê komkiribûn. Binketina rêjîmê li Idlibê jî wê lewaztiya Rûsiya derxista holê. Lê piştî lihevkirina ku di nava Pûtîn û Erdogan de çêbû, ketina Rûsiya û rejîmê ger ku dest bi operasyonê bikin ji bo Idlibê wê hêsantir be û encamên wê jî ji bo wan misogerbin.
Ji ber çeteyên ku çend salin li vir bi cih bûne hazirtiyên xwe yên ji bo şerkirinê kirin û xetên xwe yên şer baş amade kirine. Ê dema ji bo 15 km ev herêm ji destê wan were derxistin û bibe herêmên bê çek xeta wan a ku xwe tê de bi cih kirine ji holê radibe û têkçûna wan çiqas şer bikin jî hêsantire ji operasyona ku niha were destpêkirin.
Erdogan xwe niha pir jîr dide xuyakirin lê siyaseta Rûsiya ehmaqiya wî derdixe holê...